FERHAD IÇMO

EVÎNA TE

HELBEST
1998

EVÎNA TE

Helbestvan: Ferhad Içmo

Kombiyûter: F. Içmo

Derhêner û çapa dîjîtal
Sîrwan Hecî Berko
Malpera Amûdê
www.amude.de
info@amude.de

Hamû mafên çapê parastî ne.
© Ferhad Içmo û malpera Amûdê (05/2002)

DIYARÎ

Ji bo:

Mîr Miqdad Medhet Bedirxan,
bavê rojnamegeriya kurdî

Ferhad Içmo
Qamişlo- 1998

NAVEROK

Evîna te 06
Mam Welî 08
Hês'rên Gunehan 11
Min tu navê 13
Kewê Çayê Behdîna 16
Kemal 19
Evîna Xema 22
Alên Hêv'ya 26
Li Ber Ba Ket 28
Bersiv 30
Kak Bextyar 33

PÊŞGOTIN

Bi sedên sala zimanê Kurdî hatiye jibîrkirin û talankirin û edexekirin,lê nemirî ye û windanebûye,ji ber ku Bazê Stiranê Bi baskên awaz û helbestan ew parastiye.

Di qûnaxên tarî de , dema tinebûna dibistan û dezgehên ragihandinê , helbestvana bi şêweyekî nazik , bûyerên dîrokî û çîrokên kew û çiya , li ser rûpelên hişê gel nivîsandine.
Di rojên teng de, berî bazdanê, Kurda radihişt tivingê û helbestê û berê xwe didan çiya.
Ji ber van egeran, helbest bûye nasnameya gelê kurd û navnîşana Kurdistanê.
Heger ne ji helbestê ba, wê zimanê kurdî li ser darbestê ba.

Ji dil û can ez helbestên LÊMIŞTA ZOZAN, PIŞTÎ ÇI, EVÎNA TE, LANDIK û PELÊN SIPÎ dikim diyarî ji malpera (amude.de) re di gel hêviya razîbûna xwendevanan.

FERHAD IÇMO
QAMIŞLO 14-05-2002

EVÎNA TE

Heger jiyan bibe derya
evîna te bi min pêle
heger viyan bibe tembûr
evîna te li ser têle
heger bihar bin ax bibe
evîna te xaç û kêle
di nav pencê êş û xewna
evîndarim min nehêle

*** * ***

Evîna te heyvek geşe
dema sitêr winda dibin
li pêş çava xewnek xweşe
bi wê omîd şiyar dibin
mizgîniya bayê reşe
gava kanî zuha dibin
evîna te hêvya dile
dema hêvî cuda dibin

*** * ***

Evîna te hat bişavtin
di kanîkên xewn û xwînê
bû kulîlkek ji rengê dil
li zozanê Feraşînê
di şikefta Şanîdarê
berî hêsrên Mem û Zînê
evîna te di dest min de
bû kilîta deryê Jînê

*** * ***

Li ser lêvên birîna dil
evîna te sazek zîze
seba digrî berî sîga
pişti dengê te dibhîze
li dor pêtên şemala te

dilê sotî hîn dilîze
bihara geş li bê yara
şevek sare yan payîze
*** * ***
Li payîza çav bi hêsir
evîna te gulistane
di nav ewrên kîna kevnar
ew paytexta dilistane
evîna te hey'v û roke
bê te cîhan taristane
heger evîn rokê vemre
hêlîna dil goristane

*** * ***

31-7-1992

Ev helbest di kovara GELAWÊJ de Hejmar:27.28 sal:1996 li bajarê QAMIŞLO hatiye belavkirin û weşandin.

.

MAM WELÎ

Mam WELÎ .....!
felek ne li serê te bi tenê
gerya ...
werya ...
û fitilî ..... !
li gor bendê Yekemîn
ji yaseya daristanê.
bazê Pîr ...
dibe qirdikê ...
cobirk û kullî ..... !
û kev'rê mezin
li Kurdistanê.
ji serê zozana...
diherike
binya gellî ..... !

Erê MAMO..... !
tîra bêbextiyê...
ne di pişta te tenê de
çikilî ..... !
kê li Kurdistanê...
ro nîvro talankirin
zilf û gulî ..... ?
ax ... Mam Welî....

M..A..M..O..... !
bi ser de,milên wana
bi xelat û nîşana...
wa...xemilî ..... !
çendî me digot:
em aş'tî xwazin.
çendî me digot:
em perwer û nazin.
lê peymana hêvîya...
li ber dergehê...DIROGÎDA

ha...wa...terpilî ..... !

MAMO....bêje....
ma ne şerme
tawanbar....
îro li kuştî,
dike gilî ..... !!!?
MAMO....MA.....MO...
ro nîvro...
bi seda,
bê sûc,têne kuştin
û ber bi kesîve...
naçê tilî ..... !
ax .... MAM WELÎ

Ax MAMO.....
li hawîr me...
kulîlkên azadiyê dipişkivin
li hawîr me...
şemalkên serbestiyê dilivlivin
lê.....em..!
lê em vegeryane
yaseya Êlê
û sala çilî ..... !

MAM WELÎ.....!
di firehiyê de
em cendekê xorta radixin
ji bo yek kakilî.....!
û di tengahiyê de
bi yek dengî...
mîna kunda , em dixwînin
li ser axa...
wî kavilî..... !

MA....MO.....
bextê meye Mamo

zû dilê xwe...
li ber neyar,em radixin.

zû xwarina xwe...
ji ser agir,em dadixin.
sed mixabin...
tu jî biner...Mamo...
çawa xwarin,tê avêtin.
lê.....nîv kelî..... !
Mamo nîv kelî..... !
xwezî carkê
tenê carkê
li nav baxa,bipişkive
ew Nêrgiza
sê çar pelî .....!
Ax Mamo...
Ax Mam WELÎ
kes guh nade,peyv û xêzên
vî reş pelî ..... !
A.....x
em li cîhan bûne ax.
lê em mane bê ti ax
A.....x,A.....x
Ax Mam WELÎ.....!!!!????

24-3-1996

Ev helbest di kovara-METÎN-de hejmar:54
Sal:1996 li DIHOKÊ,hatiye weşandin.
Ev helbest di kovara-JIYANA REWŞEN-de,hejmar:13 sal:1997 li ISTEMBOLê
hatiye weşandin.

HÊSIRÊN GUNEHAN

De bibarin .....
ji kanîka çavên şermîn
ji xwezîyên Zîn û Şêrîn
ji omîda.....
ji birîna.....
ji ber kêlên bîr'anîna
De bibarin .....
ji axîna wan bilûra
ji dor perdên,
wan tembûra .....
ji sîpanê,berfa xwez'ya
li ser pengên,
zilf û kezya ....
De bibarin.....
hêsirê.. min
De bibarin....
Zivistan û payîzên dil
bê biharin.....
De bibarin
mîna tava
De bibarin.....

* * *

De bibarin.....
li ser şopa wan kerwana
ji landikê...
ez rêbarim .....
ez derketim
ji tarîka,wê neyînê.
bi dûrketim
ji hembêza,jîn û vînê.
çend hezar kul...?
çend hezar êş...?
min bi hêsra,ji xwer avda.
dêmên xunca,dilerizin

bi axînin...
bi nalînin...
li ber bayê pêla derda.
omîdên dil...
li ser dêmên,ewrên xwezya
bi qêrînin...
bi hewarin .....
li dilê jar,birîn û êş
bê jimarin .....
de bibarin,hemî gava
de bibarin.....

*** * ***

De bibarin,hêsirê min
de bibarin.....
bihara min,birîndar bû
bê gul barkir.....
havîna min
wek nêrgiza,tî û zuha
serî xwarkir.....
min û ewrên,vê payîzê
hês'r û baran
li hev parkir.....
zivistana malik wêran
berf û bahoz
bo min karkir.....
bi vî barî...
ezê çawa bighêm wara
bi vî rengî...
ezê çima,ji xew rakim
dost û yara....
çîroka min
ji pêşî de,du hêsirin
li ser dêma digindirin
de bibarin,ji van çava
de bibarin.....

*** * * 20-11-1995**

MIN TU NAVÊ

Min tu navê .....
hek ji perya,mîna Belqîz
tu xanîkî,bo min lêke
li ser avê .....
yan bi desta,weke Ferhad
tu zinarên,çayê hêvya
biçirîne..
ji bo avê .....
ez neyara
weke yara
li ser sînga,xwenî befrîn
xwedî nakim .....
çêlyê mara
ez ti cara
di nav gelyê,herdû sêva
kedî nakim .....
hek bi destkî
tu j' mir bîne,bi hevdûre
heyv û tavê....!!!
wek her cara...
ezê bêjim :
min tu navê.....
min tu navê.....
*** * ***
Min tu navê.....
xweş bawerke
ez dilê xwe , nakim Ûtêl
da ku her yek,bi nazdarî
tê de razê .....
kes kulîlka,
destmêj girtî , bi axêre
dike qurban , li ber bejna
şîn pîvazê .....?
bila her kes,ji mir bêje
tu bê hişe...

şaş û gêje...
ji pêşî de , ez dizanim
rêka eşqê ...
çi dirêje .....
min tu navê...
min tu navê...
hek tu agir,bo min vêxe
ji leylavê ..... !
wek her cara,
bersiva min , dîsa eve
min tu navê .....
min tu navê .....

* * *

Min tu navê.....
heger kindir,
li qirka min,bigerînin
min tu navê ...
heger berka,
wek teyrokê,
li sînga min,bibarînin
min tu navê ...
heger çava,
berî mirnê,
ji serê min,ew derînin
min tu navê ...
lê evîna ...
tevlî xwînê
di dilê min,
qet tu carî,namirînin.
evîna min ,
bilind tire , ji sitêra
evîna min ,
mezin bûye,
di nav şilfên,şûr û kêra.
hek tu hêsra...
bo min raxe ...
tu di gel min,

li vê jînê , nabî zava.
bersiva min.....
her dem eve.....
ey Celabê , di nav dava.
min tu navê .....
min tu navê .....
min tu navê .....
hek tu avbe.....!!!
ez li jînê , nema vedxum
peşkek avê .....
min tu na.....vê.

*** * ***

10-12-1995

Ev helbest,di kovara-BIHAR-de hejmar:4
Sal:1997.li QAMIŞLO hatiye belavkirin.

KEWÊ ÇIYAYÊ BEHDÎNA

Aso ...
ey hewar ...
ka ew Kewê,jar û xemgîn.....
doh mêvan bû,
li kolika menî zêrîn .....
Aso ...
sed hewar ...
kanî mîrê saza şermîn .....
ka ew bilbil
ka ew sorgul
çi zû li wî,sar bû hêlîn .....
gelo raste...
yan jî xewne,
hîna zûbû ,kekê Tehsîn.....
sed mixabin,
ey hewar û sed hewar
di seyrana biharê de,
Adarokek biçilmise.
Aso ...
ey hewar û sed hewar
dîsa li dil,nûbûn birîn .....

* * *

Aso ...
ey hewar...
((Bêrîvanê))wê kî bêje....?
((Xalxalokê)) di gel ((Çotyar))
weke ((Derdo)),
li ber ((Destar)) ...
ji êvar de , mest û hêje .....
gelo raste
fal ... derewe...
nema ((Derdo)) kes dibêje....?
heger şevê ...
Sê çar cara ...

((Yarî Dilo)) ez nebhîzim.
şev girane...
mal wêrane...
şev bê denge,pir dirêje.....
Aso ...
hey hewar û sed hewar
evîna wî...,hê ji mêje.....!

* * *

Aso ...
ey hewar ...
em tev hêlan,di nav rava.....
xwezî dîsa ...
wekî berê ...
di gel Bûkê,biba zava .....
Aso ... sed hewar,
xwezî carkê ...
min bidîta ...
helbesta wan herdû çava.....
çend hezar kul ,
wî wêran kir ...
çend hezar dil ,
wî rizgar kir ...
ji hembêza dengê tava ..... ?
Aso ...
ey hewar û sed hewar
ezê çib'kim ...
bi xwezî...û...ax..û..lava....?

* * *

Aso ...
ey hewar ...
gulkê li me dikir bihar .....
gul çilmisî.
ka ji bo çi ,
deşta hêvya,hişte beyar....?
Aso ...
Sed hewar ...
çizû li wî , dem zîvirî

şemalka geş,zû vemirî
li kerwanê...
sazên ciwan,bûye êvar .....!
bila mirin ,
tenê bêje ...
li ser pişta hespê hêv'ya
di lîzkê de,
kes namîne,her dem siwar....
Aso ...
Ey hewar û sed hewar
hey heware ..... ASO

*** * ***

31-5-1995

Ev helbest,di kovara-ZANÎN-de hejmar:12
Sal:1997 li QAMIŞLO hatiye weşandin.

KEMAL

Ev helbest diyarîye ji bo axa gora pakrewanê Nemir Kemal DERWÎŞ

Dikim nakim
ez gaziya , berê sibê.
ji mizgefta , bawer nakim ...
vê hewarê...
wê qêrînê...
vê gaziyê ...
wê nalînê ...
ji Izgehê , bawer nakim ...
du darbesta,
ez dibînim , li ser desta
navê ... KEMAL ....
li ser sîngên , qîz û xorta
ez dixwînim,wek helbesta ...
lê...dixwazim
wekî berê...
ji vê xewnê,serî rakim ...
ez dixwazim
di gel Kemal,wek her cara
ber bi malê,dîsa barkim ...
gelo raste ... ?
wilo bi lez,Kemal barkir.
dikim nakim,dikim nakim
dikim nakim,bawer nakim ... !

*** * ***

Ez çi bêjim ...
ka çi deynim ...?
ji nenûkê, heta serî
ezê îro , bikim gulek
li ber serê
Kemal deynim ... !
ez çi bêjim ...?
Pey'v xemgîme

hember pesnê,navê Kemal
di ziman de,peyvek nîne ...
ez çi bêjim ...?
pey'v şermîne
jiyan baxê,xewnên xweşe
yên wek Kemal
bexçevanin
her dem li nav,rûniştîne ...
ka ... çi bêjim ...?
pey'v raketin ....
dema refên,miletê jar
li pey Kemal
dil şikestî bi rêketin ...
wê çi bêjin ,ez çi bêjim
pey'v jî gêjin ..... !!!?

* * *

Ji nû îro
ji sitêra,ez dipirsim
kanî Kemal ..... ??!
ji nû îro
me baş naskir,kê dida me
ji kaniyên,çayê Berzan
ava zelal ..... !!?
ji nû îro
em şiyar bûn,wek serxweşa
lê winda bû,ji pêş çava
xewn û xeyal .... !!!
ji nû îro
weke rokê,va xuyakir.
bi xwîna xwe,kê di dest me
dagirt peyal ..... ??!
ji nû îro
bi milet re , ezê bêjim :
heger Kerwan,li ser hev be
namre Kemal,namre Kemal
namre .....Ke.....mal..!!!!!

* * *

7-11-1996
Ev helbest di kovara -GELAWÊJ-de hejmar:27-28 sal:1996 û di kovara METÎN-de hejmar:58 sal:1996 hatiye Weşandin û belavkirin.

EVÎNA XEMA

Xema necivîn , dil bû goristan
va li min û te , bûye zivistan
kocer vegeryan ,li warê kevnar
ketin xewa xweş,dost û evîndar
tenê Sazên te,di nav perdên şev
bûne nalînek , li ser lêvên dev
dil û cergê xwe , te da ber tîra
tu bû serkêşê , dîlana pîra
*** * ***
ka evîna min , ka ew baxê şîn
xewn û hêvyê min,tevde helweşîn
ez bûm peyala , destê bê çara
tu bû şivanê , qîr û hewara
ne ez giham te , ne tu giha min
heta bi xewna , li me bûn dijmin
sorgul çilmisî , li hêvya bilbil
bilbil hat sotin , bi evîna dil
*** * ***
ma wê çima dil , neke nalenal
çav bûn peyala , hêstirên zelal
te ez xistime , rêza bê soza
ez bûm Nesrînek, di nav bahoza
ez bûm nîşana , evîna winda
li şûna warê , konê revenda
bê biharim ez , li min payîze
jîna min şeve , tarî û zîze
*** * ***
Gulfiroşa gul , da bi erzanî
dil firoşa dil , da bi nezanî
perperîka mest,hate seyranê
Ji bo maça dêm,ket goristanê
evîndara hiş , avêt ji serî
tenê ez mane , li paşya derî
xema di dil de , ez dilorînim
rondikê xwezya,ez dibarînim
*** * ***
dikim nakim ez ,dil nayê rayê
ji zindana wî , kulek dernayê
dil bûye baxê , êş û birîna
şev kete dava , qîr û lorîna

wer li êşa min ,carkê bipirse
ji sitêrên şev , ti car netirse
were netirse ,ji vê heyva gêj
ji bo xweşya dil,sozkê bid û bêj
*** * ***
ez gula te bûm,xemla min werya
kevrê ker û lal, li ser min girya
destê min derxîn , ji bend û lela
li min vegerîn , kildanê kila
ketim bextê te ,xewa min nayê
ma tu nabîne , hesrê ber bayê
dotmama teme ,tu min nabîne
ji vê tarîyê , zû min derxîne
*** * ***
bi xebat û çeng , bi zanîn û şer
ji xew şiyarke , cîhan sera ser
perda biçirîn , ji dor xemla min
wer min azadke , ji qeyda dijmin
wer min bixwaze,ji destê mirnê
bi xam û agir , bi saz û zirnê
pirin xwazgînî,tên min dixwazin
bixe destê min , gustîlk û bazin
*** * ***
bi xêr û xweşî , kes tiştkî nade
destê gunehkar , bê ol û dade
nemîn li hêvya , ax û xwezîya
kes bi xwezîya , naghê kezîya
destê min bigre , ezim yara te
ji baxê Jînê , ezim para te
ezim asoyê , omîd û lava
ezim buhişta , stêr û sîtava
*** * ***
buhişta te bûm, lê zû tu revya
ez bûme mêrga , çeqel û rovya
ketim nav pencê,şeva dîl û mest
dost û hevala,xatir ji min xwest
herdû çavê min, hîn hêvîdarin
li hêviya te , rondik dibarin
çima tu revya , ji hembêza min
şeva reş te kir,xem'l û xêza min
*** * ***
rûkê minî gewr , dîrokê reşkir

pifkir birînê , pêta wê geşkir
lehya xwîna sor,ez dam ber pêla
heta bi hêvya , destê min hêla
berfa kevnare , derî li min girt
çira min nivya,pêta wê vemirt
feleka bê bext,pişta xwe da min
ji ava jînê , qurtek neda min
*** * ***
dem û dewran tev,li me bûne yek
leşkerê mirnê , hatin lek bi lek
gula min û te , dixwazin rakin
ji baxê Jînê , koça me barkin
hewarê bighîn , dost û hevala
bi kêr me nayê , ew xewna vala
were bipirse , li rewşa wara
çima bê dengin , sazên dildara
*** * ***
li dilê yara , îro payîze
bayê reş û kur , bi wa dilîze
di şikeftên xwe,bê zar û dengin
heger şiyarbin , mêr û lehengin
mane li hêvya , xewna Adarê
bê xwîn geşnabe,gula yek darê
werin destê mi, jiyan seyrane
dîtna we li dil , tavek barane
*** * ***
vaye bihar hat,ka seyrana min
vaye Adar hat , ka dîlana min
bilbil vegeryan, li dêmên gula
qîza dest avêt, kildanê kila
çima hûn nayên,reqs û semayê
li şahiya min , pêjna we nayê
werin destê min,jiyan seyrane
dîtna we li dil , tavek barane
*** * ***
seyrana mine , dîlana mine
dilê bê wara , hêlana mine
werin bibînin, xemla bala min
yek qurtê vexun,ji peyala min
taca min bînin,deynin ser serî
bera birêsin , kevok û qumrî
roka min hilat,va ez rizgarbûm

ji xewa sala , dîsa şiyar bûm
*** * ***

12-2-1994

Ev helbest di kovara-GAZÎ-de hejmar:26
Sal:1997 li DIHOKê hatiye weşandin.

ALÊN HÊVÎYA

Alên hêvya , wa derketin
ji nav pêlên, derya xema
berf û bahoz,bi dûr ketin
ji sînorên , bûka dema
nalînên dil , bi rê ketin
li ber pêtên , ava çema
lav û hewar , tev raketin
di hembêza , zaz û sema
*** * ***
alên hêvya xweş ronakin
li ser taca , bûka cîhan
diçirînin , perdên şeva
ji dor dêmên , gula zozan
hûr xunavê , dibarînin
li kulîlka , warê xopan
biharek geş , li me hilat
bi seyran û saz û dîlan
*** * ***
alên hêvya , wa hilatin
ji nav gorên, pakrewana
tîrên rojê , xweş xelatin
li şûnmayê, ji kerwana
dîsa ji nû , bilbil hatin
ji serdana , êş û jana
wekî berê ,mest û matin
gul di hembêza perwana
*** * ***
alên hêvya , wa dilîzin
li ezmanê , Kurdistanê
nav têdanê,em dibhîzin
ji nav axa , goristanê
xweş awazin,naz û zîzin
li nik pêtên , çiristanê
pêwanên dil,xort û qîzin
bilbil hatin , Gulistanê

*** * ***

25-9-1992

Ev helbest di kovara-BIHAR-de hejmar:3
Sal:1997 li QAHIŞLO hatiye weşandin.

LI BER BAKET

Li ber baket , jiyana min
weke tûmên , kelemperê
di xewna de,hîn dibhîzim
nale nalê , wê dîlberê
Ka şemalka , taristana
ka ew finda , di pencerê
Ka bihara , dost û yara
kanî rewşa , warê berê
*** * ***
li ber baket , wek sitêrkê
di nav mijê , taristana
jiyan borî , li pey hêvya
di nav kêlên , goristana
bê biharim , hîn beyarim
li paş perdên , zivistana
ka kulîlka,xewn û hêvya
kanî bûka , gulistana
*** * ***

li ber baket , jiyana min
pêla êşa , dil hilanî
di nav baxê , bîr anînê
li min derbûn,hezar kanî
wê Şemalkê , bi nazdarî
di nêv dil de , pêtek danî
ka peyala , herdû lêva
kanî meya , kamîranî
*** * ***
bê jiyanim , li vê jînê
êş mêvane , li birînê
xweş xamene,herdû hêsir
li rûpelên , bîr anînê
meya êşa , ez dinoşim
ji nalînên , Mem û Zînê
ne ez tenê , windayîme

di nav pêlên , vê evînê

*** * ***

5-8-1993

Ev helbest di kovara-GELAWÊJ-de hejmar:26 sal:1996 li QAMIŞLO hatiye weşandin..

BERSIV

Diyarî ji bo R.DILOVAN

Berî rêz û silava
destpêk bi navê Yezdan
ez vê namê dişînim
ji bo kekê DILOVAN
li ser serê ê wek min
te xwe kirye rexnevan
xwelî li serê mebe
Gurî va bûye semyan
*** * ***
Rexnevanî ka çiye ?
were ji bo min bêje
bihayê gotarekê
ma bi peyvên qirêje ?
bi dîtina diriste
neb' zimanê dirêje
kesê nezan û bê hiş
tîra erzan davêje
*** * ***
Te ez dame ber tîra
Ji min neke gazina
ez Ferhadê xemgînim
ne şivanê bizina
heger pênûsê hildim
di gel sûnda mezina
kesên wek te dimînin
palên ceh û kizina

*** * ***
Hespên fala nalkirin
kevjal lingê xwe hildan
xêlyê bûkê nêzîk bûn
beqa çavên xwe kildan
veger li gotara xwe

wek peqpeqa zik çaydan
keko rûnê li malê
hîn tu dûre ji ziman

*** * ***

Te riswakir yara min
bi wa peyvên rûtkirî
bêyî ku tu nasbike
yara li paşya derî
Welat yare kekê min
her kes li ser wê digrî
meya kevnar çêdibe
ji hêsrê mêwa tirî
*** * ***

Zanebûna teyî pirr
ji edrêsê diyare
çizû tu bû rexnevan
hîn qada te beyare
naveroka helbesta
bi te gelkî dijware
helbest xewnek bilinde
ne birinc û savare
*** * ***

Çend gotarên teyî rij
min xwendine lê bi zor
te ji nik kê aniye
rêzimanek bê sînor ?
ma tu şûjnê nabîne
di wî çavê xwenî kor
bawer bik ji birê xwe
bibe şifêrê gundor

*** * ***

Keko pênûs erzan bû
dema tu bû nivîskar
ji vî navî bi dûrkev
bihêl ji bo xwedyê Kar

dîsa ji min bawer bik
qet tu naghê Serê car
bi vî hawî tê bêje
sed xwezî bi sala par
*** * ***

19-11-1996

Ev helbest di rojnama:Azadiya WELAT de.hejmar:65 sal:1997 li ISTENBOLê hatiye weşandin.

KAK BEXTYAR

Kak Bextyar .....
dema te xweşbe, dîsa wek her car
pisîka mûdî, çi zû bi çil ket
û yeka yeka,serê çêlîka
bi dû hev de xwar .....
agir girtiye,baxêt xewnê me
Nêrgiz şewitîn
Beybûn peritîn
Qumrî kemitîn
Bilbilê xemgîn ,di nav xwînê de
hewar dike hewar .....
birînên li dil
kevnar û kûrin
em û vê lîzkê
ji hevdû dûrin
tu kes nizane,kanî çiye qoz
li nav hev ketin,maçe û sînek
kûbe û dînar .....
beydeqên dor şah
fîl û hesp û rex
ji hevdû dûrin
mane bê ti nerx
Şahê Dilbijok,ketiye davên
dînar û dolar .....
refên Pêşmerga
bûn dijminê hev
bi dilkî xemgîn,ji serê zozan
xwe berdan bajar .....
textê azadyê
ew textê kevnar
di bin cendekê,mafê bê sînor
bû perçe û par .....
çibkim Kak Bextyar
gur û dûşivan,li pêş çavên me
bûne dost û yar .....

komên hewarê,ne li ser hevin
ji hevdû dûrin,wek roj û şevin
civata hêvya ,ji hev belabû
çi zû bû êvar .....
Pakrewanên me
gazî me dikin:
mixabin ... gelo
mixabin ... Kurdo
li ber dergehê,sedê bîst û yek
tu ma dest vala,bê çek û fîşek
Kurdo rawiste,ma xwîn ne bese
Kurdo ya sitar .....
raste Kak Bextyar...
ti car ala Kurd
bi destê dijmin ,ji ezmanê Me
nayê ber bi xwar .....
lê bi destê me ... !
çend hezar kulîlk,çend hezar sorgul
çend hezar kevok,çend hezar bilbil
mane bê hêvî,mane bê omîd
mane bê bihar .....
ho ..... Keko
me dahol anî
me sifre danî
kefenê hêv'ya ,ji nû me vekir
me ew vejandin,me ew lorandin
med' got em tevde,îro rizgar bûn
ji bin şiv û dar .....
lê ... dawya dawî
wek kurka bawî
me bi vî hawî
pişti pênc sala,li dîwar nexist
tenê yek bizmar .....
min got ezim mîr
te got ezim mîr
em tevde bûne,serok û wezîr
kerî û kerwan ,bûne nêçîra
devê gurê har .....

çavê me kor bû
guhê me ker bû
em li şûnwara,mane bê nîşan
mane bê biryar .....
jar û perîşan , dîl û belengaz
kêzik û mêşa,di devê me de
qurmê ziman xwar .....
li Welatê Me
yek xame nema,bê lay û serbest
ketin bin desta
kovar û pirtûk,awaz û helbest
pira rastiyê
di bin tirsê de,wek camkê şikest
li Welatê me,tenê yek xame
nema bê hefsar .....
Keko sed hewar .....
danê me tine,meyra me tîre
xeta xwar û leç,ji gayê Pîre
me bi destê xwe
li xwe kir payîz
li me zuha bû , bax û dar û rez
kanî û cobar .....
Keko sed xwezî
bi berf û sermê
tev li hêviya , dema dibarya
ji ezmanê sar .....
dîsa wek her car...
dema te ma xweş..
ez bi hêvî me ,tu her bimîne
dilşad û Bextyar.

* * *

21-8-1996

Ev helbest di kovara-BIHAR-de hejmar:5
Sal:1998 li QAMIŞLO hatiye weşandin.

Ferhad IÇMO :

Di sala 1960´î de li bajarê QAMIŞLO hatiye dinyayê, Li dibistanên bajarê QAMIŞLO xwendina xwe bi dûmahî aniye. Di sala1984´an de bawernameya-BEKELORYOS - di endazyariya şaristaniyê de ji zankoya HELEBÊ wergirtiye. Berî helbestê, dil ketiye mûzîkê û di sala 1970´ê de dest bi lêdana tembûr û gîtar û cumbişê kiriye.
Lê di 29.07.1978´an de helbesta xwe ya yekemîn bi navê –EY ZEMAN- daniye.
Di piraniyên kovar û rojnameyên kurdî de helbestên xwe weşandine û nêzîka çil helbestên wî bûne stran, bi dengê:
Mihemed ŞÊXO, Beha ŞÊXO, Adil HIZNÎ, Selah OSÊ, Isma'îl CUMA, Gulistan SOBARÎ û ŞEYDA.
Heta niha pênc pirtûkên helbesta çapkirine:
1- LÊMIŞTA ZOZAN 1988
2- PIŞTÎ ÇI 1995
3- EVÎNA TE 1998
4- LANDIK-1- 1998
5-PELÊN SIPÎ 2000
Pirtûka LANDIK- 2- ya helbestên zarokanî di bin çapê de ye.

NAVNÎŞAN
Ferhad Içmo
P.O.BOX:171-Kamishli- Syria
Tel: 00963 52422597 – 421012
Mobile: 00905367907929